
KMR

# *Pencemor û Eurodac*



©iStockphoto / janp013

**Agahî bo welatiyên welatên sêyem û bêwelatiyan yên ku li ser sinor bi qaçaxî tên girtin ((YE) N:o 603/2013 madeya 29 benda 3)**

Eger tu 14 salî an mezintir bî û bi awayekî neqanûnî ji sînor derbas bibî, dê pencemorên te werin girtin û radestî databasa şopa tiliyên Eurodac bikin. Li gorî qanûnê, hûn nikarin pencemorên xwe red bikin.

Eger pencemor bêkalîte bin an jî we bi qestî tiliyên xwe xera kiribe, pencemor dikare paşî were girtin.

Eger tu paşî dîsa serlêdana penaberiyê bikî, dê dîsa pencemora te were girtin. Eger tu li welatekî cihê ku pencemora te wergirtiye serî lê bidî, dikarî vegerin welatê ku yekem pencemora te lê hatiye kişandin.

Pencemora bo heyama 18 mehan tên qeydkirin. Piştî hingê pencemor bi otomatîkî ji danegehê tên Di danegeha Eurodac de dikarin pencemor û agahiyên derbarê zayendê qeyd bikin. Eurodac nav, wêne, dema jidayikbûnê yan welatîniyê qeyd nake.

Herdem dikarî bipirsî ka çi agahî derbarê te di danegeha Eurodac de hatine qeykirin, ji welatê ku pencemora te girtiye. Dikarî daxwaz bikî ku agahiyên şaş werin rastkirin yan jêbirin. Agahî dikarin bo nimûne hingê werin jêbirin eger te welatîniya welatekî YE yan hevbendî peymana Dublînê be yan jî îqame heye li welatekî û te daxwaza penaberiyê nekiriye.

Danegeha Eurodac ji aliyê daîreya Yekîtiya Ewropayê ya bi navê eu-LISA ve tê birêvebirin. Agahiyên te tenê dikarin bo armancên bi qanûnê diyarkirî werin bikaranîn. Agahiyên te tenê dişînin navena pergala Eurodac. Eger paşî li welatekî din yê YE yan hevbend[1)], daxwaza penaberiyê bikî, pencemorên te bo wî welatî tên şandin. Agahiyên qeydkirî bo ti welatekî din nayên şandin yan bo ti dezgehek din yên YE yan derveyî welatên hevbend.

Ji 20î tîrmeha 2015 pêve hinek karbidestên din jî lêkolînan li pencemoran dikin, bo nimûne polîs û dezgeha polîsê Ewropayê (Europol) ku dikarin daxwaza mafê bikaranîna danegeha Eurodac bikin bo rêgirtin, aşkerekirin û lêkolîn tawanên cidî û terorîzmê.

---

**1) Agahiyên pencemora te rê didin ku hemû 27 welatên endamên YE û her çar welatên hevbendên Dublînê (Norwec, îzlanda, Swîsre û Liechtenstein) agahiyên pencemorên te bi kar bînin.**

**©Yekîtiya Ewropayë, 2014**
**Kopîkirin metnê ruxsetdayî ye. Bo bikaranîn yan kopîkirina wêneyan divê yekser ji mafhilgirên her yekê ji wan were pirsîn.**

## Agahiyên têkilîdanînê

**Tomarhilgira Eurodac û nûnerên wê**
Têkilîgeh: Birêveberiya Polîsan (Poliisihallitus) û Daîreya Koçberan (Maahanmuuttovirasto)

**Agahiyên têkilîdanînê yên nivîsgeha tomarhilgirê**
Birêveberiya Polîsan
Poliisihallitus
PL 1000 (Vuorimiehentie 3),
02151 Espoo
+358 295 480 181
kirjaamo.poliisihallitus@poliisi.fi

Daîreya Koçberan
Maahanmuuttovirasto
PL 10, 00086
Maahanmuuttovirasto
Tel. +358 295 430 431 (veguhastin)
migri@migri.fi
www.migri.fi

Eger dixwazî bi agahiyên ku di pergala Eurodac de di derbarê te de hatine tomarkirin bibînî, serî li polîs bide. Bo peyitandina nasnameya xwe amade bibin.

Em pêşniyaz dikin ku bi navenda polîsê ku serlêdana we ya penaxwaziyê wergirtiye re têkilî deynî. Agahiyên têkilîdanînê yên xizmetgehên polîsan li ser malpera polîs tên dîtin, poliisi.fi.

**Agahiyên têkilîdanînê yên rayedarên agahîparêziyê yên neteweyî**
Daîreya nûnerê zanyarîparêziyê
Tietosuojavaltuutetun toimisto
Navnîşana serdanê:
Lintulahdenkuja 4
00530 Helsinki

Navnîşana posteyê:
Tietosuojavaltuutetun toimisto
PL 800
00531 Helsinki
Telefona veguhastinê:
+358 29 566 6700
Telefona şîretên giştî bo takekesan: +358 29 566 6777
duşem heta pêncşem saet
9.00–11.00
tietosuoja@om.fi
www.tietosuoja.fi

European Commission

EUAA
EUROPEAN UNION AGENCY FOR ASYLUM

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

POLIISI
POLISEN I FINLAND
Police of Finland

Rajavartiolaitos
Gränsbevakningsväsendet
The Finnish Border Guard

21.2.2024 - kurmandzi